



**Xelkê xebatkar yê Kurdistanê
digel rêbaza şehîdên Kurdistanê
peymanê nû dikan**

»»» R:3



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

*Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (331)06-08-2018 Buha (1000) Tûmen*

Destên xelkê birçî, gevriya rayedarên têr dişidîne



Hevdem digel berdewamiya nerazîbûnên cemawerî, li bajarên Îranê de, Komara Îslamî dest kiriye bi komeke çalakiyên xapînok bi armanca jirêderxisina meşên nerazîbûnê, lê nerazîbûnên xelkî di rojên borî de, hemû cendekê rejîmê kirin armanc.

Şeva borî bo cara pêncem bû ku li çendîn bajarên biçûk û mezin ên Îranê de, wekî Tehran, Kerec, Qum, Şîraz, Qehderîcan, Ebher, û Kazirûnê meşên nerazîbûnê serbarê hebûna rewşa ya ranegehandî, bi rê ve çû, ku di hinek bajarên de jî şer û pevçûn rû dan. Li gora dawî raportên pêwendîdar herçend rejîmê hewl da ku ji riya qutkirina elekterîkê û înternetê ve, rêgir be ji gehandina dawî zanyariyan, û nûçeyan di van bajar û naveçeyan de, lê dîsan şikest xwar, û xelk bigurtir ji caran diruşma rûxandinê dan, ew jî li van bajaran de ku bi salan e rejîm hewl dide wan bajaran her di bindestiyê de ragire, wekî bajarê Qum ku wekî paytexta mezhebî ya rejîmê tê hesiban-

»»» R:4



Pîrozbahiya Lêpirsyarê Gîştî ê PDKÎ li Koçer Bîrkar

Lêpirsyarê Gîştî ê PDKÎ seba serkevtina dîrokî û cîhanî ya bîrmendê Kurd Koçer Bîrkar pîrozbahî li vî zanayî kir.

Mistefa Hicrî Lêpirsyarê Gîştî ê PDKÎ di peyameke pîrozbahiyê de, rêz ji serkevtina mezin ya bîrmendê Kurd Koçer Bîrkar girt.

Deqa peyamê weha ye:

Rêzdar Koçer Bîrkar

Nûçeya serkevtina we di bidestxistina mîdala bilind ya zanistî, wekî xortekî Kurd û bi taybetî wekî xortekî xelkê gundê “Nê” ya qehremanperwer, û serbilind bi xebata neteweyî, û wargehê Demokrat, bû sedema dilxweşiya me.

Di vê derheqê de, em pîrozbahiyên herî germ ên xwe, dibêjne we, û hemû “Nê”yiyên hêja, û xelkê jêhatî ê Kurd di her cihekî de.

Mînakên wekî we li hemû Kurdistanê û bi taybetî li Kurdistana Rojhilat zêde bin, û serkevtina we berdewam be.

PDKÎ

Lêpirsyarê Gîştî

Mistefa Hicrî

Rasan û xebata çekdarî

»»» R:4



25`ê Gelawêjê bazneyeke bi- hêz, felsefeyek Netewî

»»» R:5



PDKÎ avekera Koma- ra Kurdistanê û xwed- iyê Rasana Rojhelata Kurdistanê

»»» R:6



Jina pêşeng û pêşmerge

»»» R:8



Sergotar

Rasan û nerîna
piralî

N: Kerîm Perwîzî

Gellek caran pirsyarên ciddî li kesatiyan, girûpan, yan li neteweyekê têne kirin, û dîroka mirovahî, siyasî û hizrî jî, gelek rûpelên bi vî rengî tomar kirine.

Carna kesatî û girûpan, bersiveke yekalî dane pirsyaran. Wan, di bin givaşa siyasî, aborî û gefa li ser jiyana pêşerojê û dehan parametirên din de hêlêke yekalîker ji xwe re destnîşan kirine, û vî aliyê hêlê, weke dirust û bihedar binav dikin, û aliyê din jî weke nehêja didin binavkirin. Bersivên bi vî rengî yekalî, bi kîjan sedemê jî be, civak hatiye neçarkirin ku ji ber hêsanbûnê, zû wan bersivan tevî xwe bike.

Ew, hêlêke zelal e, ji ber vê jî civak bi hêsanî ji wê fêhm dike. Lêbelê gelek tişt jî bê bersiv hêla ne, û di rastî de bûye îdeolojiyek ku di dîrokê de jî gelek tawan bi navê îdeolojiya yekalî ve hatine encamdan.

Mijara bingehîn a niha a doza civaka Kurdistanê Rojhilat ev e ka gelo di vê serdemê de ku Kurdistan derbasî qonaxa Rasan angû Rabûnê bûye û civaka beşên din ên Îranê jî dirabe û dibe ku vulkanên han biteqin, divê em çawan li pîrsa demokrasiyê li Îranê binêrin?!

Bersiv eger yekalî be, ev e ku me Kurdistanîyan ti xêrek ji neteweyên derdorê nedîtiye, û li ser bingeha ezmûn û mifahdarnebûnê, divê em xwe bihêz bikin û dev ji demokrasiyê ji bo derdorê berdin.

Ne xuya ye ka gelo ev bersiv, me ber bi kîjan pêşerojê ve dibe, lêbelê eger piralî li mijarê binêrin û li ser xurtkirina Rasanê û danîna pêşerojêke din bifikirin, divê bersiva piralî çî be?! Her pirsyarek, tenê bersivêkê lixwe nagire û her bersivêk jî bersiva hertimî nîne. Mirov dikare li pey bersivên piralî

Femandariya Hêza Pêşmerge Kurdistanê daxuyaniyek ji bo raya giştî belav kir




Femandariya Hêza Pêşmerge Kurdistanê derbarê şehîdbûna hevalekî wefadar û pêşmergeyekî qehremanê gel, daxuyaniyek da raya giştî.

Daxuyanî wiha ye:

Daxuyaniya Hêza Pêşmerge Kurdistanê

Di berdwamiya kar û çalakiyên Hêza Pêşmerge Kurdistanê de, hejmarek ji pêşmergeyên vîrek ên Kurdistanê, dema ku



serdana malbatên şehîdan û endam û alîgirên PDKÎ dikirin, êvariya 21'ê Pûşperê rastî xefika sîxurên îtila'atî ên rejîmê hatin, û mixabin du pêşmergeyên xebatkar û emegnas bi navên kek "Şehab Heyderî" û kek "Hejar Rizayî" hatin şehîdkirin û tevî karwanê şehîdên hizb û gel bûn.

Hevçeperê şehîd, Şehab Heyderî kurê Usman, roja 1'ê Xermanana 1351'an a Rojî li gundê "Serçinar" ê Mehabadê ji dayîk bû û heya qonaxa sêyem a navendî çû xwendingehê û piştî dev ji

xwendinê berda.

Sala 1371'an a Rojî bi rêxistina veşartî a PDKÎ re dikeve nava pêwendiyê. Roja 18'ê Xermananê a sala 1373'an diçe serbaziye û piştî 21 mehan ji serbaziye direve. Ji sala 1389'an a Rojî ve, weke endamê rêxistina veşartî a PDKÎ ji bo karên rêxistinî serdana PDKÎ dike.

Roja 30'ê Xezelwerê a sala 1395'an a Rojî eşkere dibe û ji Rojhilat derdikeve û tevî refên PDKÎ dibe û dibe pêşmerge.

Ji wê demê ve heya dema şehîdbûnê di kar û xebata xwe û bicîkirina erkên partiya xwe de berdewam bû, û her karek ji dest wî hatibû, encam dîda.

Mixabin roja 21'ê Pûşperê ji aliyê xayîn û xwefiroşên gel ve rastî êrîşê hat û tevî karwanê şehîdên hizb û gel bû.

Şehîd Hejar Rizayî xelkê gundê "Qela" ya Miyan-doawê jî di malbateke Kurdperwer de ji dayîk bû. Malbata wan sê şehîd ji bo serbestiya Kurdistanê dane.

Şehîd Hejar weke endamekî çalak û biwec ê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê xebata xwe berdewam dikir, û di erkê herî dawî ê rasipartî de bi şehîd Şehab Heyderî re tevî karwanê nemirên hizb û gel bû.

Em ji aliyê rêberiya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê û Femandariya Hêza Pêşmerge Kurdistanê ve, sersaxiyê didin malbatên wan ên hêja û xelkê xebatkar ê Kurdistanê, û xwe şîrikê xema wan dizanin.

Femandariya Hêza Pêşmerge Kurdistanê

be û bersiv jî, ji hev cuda bin.

Yek ji wan bersivan dikare ev be ku em xelkê Kurdistanê Rojhilat, bixwazin yan nexwazin, niha di jeografiyêke bi navê Îranê de dijîn û hîn me biryara avakirina dewleta serbixwe neda ye. Lewma divê em hewl bidin bi aliyên din ên vê jeografiyê re li pey hevhişir û hevpeymanan bigerin û nirxa wê jî bidin da ku ew jî xwestekên me fêhm bikin û li dewsa ku hêncetê bidin wan ku şovînîzm di nava wan de berfireh bibe, divê bi awayekî eşkere û bê şerm behsa xwestekên xwe bikin û bêjin ka emê çawan bikarin bi hev re bibin xwediyên jiyaneke baştir. Ji alî din ve divê rê nedin şovînîzm li civaka me jî çê bibe ji ber ku rabûna neteweyekê, hevpariya hemû neteweyên din jî dixwaze.

Rasana Rojhilat, nikare hem xelkê din di jeografiya hevpar a Îranê de kêmbibîne û bi çavekî sivik li wan binêre, hem jî li bendê be, ku pêşerojê ew jî nebin dujminên Kurdistanê. Hevdem Rasana Rojhilat nikare bi şerm biaxeve û behsa xwest-



ekên xwe û aliyên din neke. Herwisa Rasan nikare li bendê be ku hemû Kurdistanê tevî Rasanê bibin lê hizra şovînistî di nav xelkê de zêde bibe û beşek yan jî pêkhateyêke civakê bê piştguhixistin. Rasan nikare jî tenê li ser milên girûpek yan jî çend girûpan be û yên din jî, ji dûr ve destên xwe bi vî agirî germ bikin.

Ev dikare yek ji bersivan be, û bersivên din jî bêne vedîtin. Lê demokrasi, tê wateya beşdariya xelkê di jiyana siyasî û civakî a welat de û nikare parek ji xelkê xwe û ên derdorê ji bîr bike ji ber ku piştguhixistin û ji bîrkirin, mirov di pêşerojê de rastî bahoze tînin.

Hevjîna şehîdekî Rasanê peyamek belav kir

Hevjîna şehîdekî Rasanê bi belavkirina peyamekê, tevî baskirina ji xema xwe ji ber jidestdana hevjinê xwe, emegnasiya xwe ji bo rêbaza hevjinê xwe nîşan da, û got ku dersa emegnasî û nîştimanperweriya hevjinê xwe, wê ji bo zarokên xwe bibêje.

Rêzdar “Peyman” hevjinê şehîd Şehab, di vê peyamê de îşare bi valahiya mezin a ji ber jidestdana hevjinê xwe û bavê 5 zarokên xwe kir û got: Ez serbilind im bi vê ku hevjinê min di kincê pîroz ê pêşmergeyatiyê de, û li pêxema serbestî û rizgariya gel û nîştiman de, xwîna wî tevî xwîna wan hemû şehîdan bûye, ku ji bo armanceke pîroz, canê xwe bi axa pîroz a nîştiman bexşîye.

Navbirî di doma axavtinên xwe de got ku: Herçend ku ev xema ji bo me xemeke tijî jan e, lê dilsozî û emegnasiya hevjinê min derheqê rêbaza şehîdên Kurdistanê, êş û kulên me kêmkirin, û ew yek min tîne ser vê baweriyê ku ez jî emegdar bim, bi rê û rêbaza pîroz a wî, û dersa emegnasî û nîştimanperweriya hevjinê xwe ji bo zarokên xwe bêjim.

Rêzdar “Peyman” hevjinê şehîd Şehab, di dome de sersaxî gote malbata “şehîdê bajar”, şehîd “Hejar Rizayî” û xwe şîrkê vê xema wan zanî. Di dawiyê de jî, tevî spaskirina li hemû hevrê, hevçeper, dost û naskiriyên şehîd “Şehab”, kadr û pêşmergeên hizbê û bi taybet Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, got ku: Hêvî dikim ku heval û hevçeperên şehîd “Şehab” û şehîd “Hejar” li ser rêbaza wan berdewam bin, û tola xwîna ku bi neheqî hatiye rijandin, li dijminê gelê me bistînin.



Xelkê xebatkar yê Kurdistanê digel rêbaza şehîdên Kurdistanê peymanê nû dikin



Endam û alîgirên PDKÎ û xelkê têkoşer yê Kurdistanê, piştî şehîdbûna du pêşmergeyên qehreman yên Kurdistanê, şehîd “Şehab Heyderî” û “Hejar Rizayî” tevî şandina peyamên hevxiyê, peymanê xwe digel rêbaza du şehîdên nû yên Kurdistanê nû kirin, ku heta gihîştin bi armancên wan riya wan didomînin.

Li gorî nûçeya ku gihîştîye malpera “Kurdistanmedia”yê, endam û alîgirên PDKÎ, xelkê têkoşer yê Kurdistanê di bajarên weke Sine, Urmiye û Seqizê bi şandina peyamên hevxiyê, peymanê digel rêbaza du şehîdên bi navên “Şehab Heyderî” û “Hejar Rizayî” nû kirin, ku heta gihîştin bi armancên wan riya didomînin.

Urmiye

Silaveke germ bo xebata azadiya Kurdistan “Rasan”ê

Em endam û alîgirên hizba hezkirî ya xelkê Kurdistanê Rojhilat, PDKÎ,

li “Diza Mirgewer” haydar bûn ku du pêşmerge ezîz û qehreman di şerê digel hêzên rejîma Îranê li bajarê Bokanê şehîd bûne, em bi şehîdbûna wan şanaziyê dikin û dubere axavtinên nemir “Dr. Qasimlo” li bîra dijminên gelê Kurd tînin ku, “Gelek ku azadiyê bixwaze, dibe nîrxê vê azadiyê jî bide”.

Em perwerdê vê mekteba mezin in, û ji bo azadiya gelê xwe tê dikoşin, heta ku digihîjne armancên xwe.

Her bi vê boneyê ve jî sarsaxiyê dibêjne hemû kadr û pêşmergeên dilsoz yên xwe, û xwe hevparê vê xema malbata wan du şehîdan dizanin, û peymanê emegnasiya xwe digel PDKÎ nû dikin û heta gihîştin bi armancên xwe ku azadiya neteweya me, têkoşînê dikin, û riya şehîdan didomînin. Serkevtin ji bo pêşmergeyên Kurdistanê, û mirin û neman ji bo caş û dijminên Kurdistanê.

Endam û ciwanên Diza Mirgewer.

Seqiz

Endamên rêveberiya PDKÎ, malbatên serbilind yên şehîdan, pêşmergeên qehreman yên çiya li bajarê Seqizê, silavan ji bo we dişînin, û sersaxiyê dibêjne malbatên wan du şehîdên canfîda yên çiya û şaniziyê bi we dikin û hêviya sibirê ji bo malbat û temendirêjiyê ji bo hevçeperên wan dixwazin. Peymana emegnasiyê digel wan nû dikin û hemû aliyê xatircem dikin ku, heta serkevtinê dirêjîderê rîyan şehîd “Şehab heyderî” û şehîd “Hejar Rizayî” û hemû şehîdên PDKÎ û gel dibin. Komara îslamî ya Îran a terorîst ku di dawiya temenê xwe yê nehs û tijî ji cinayet yê xwe de ye, û bê guman ev roj ku hemû xwefiroş û kirêgirtiyên girêdayî bi vê rejîmê bidine destê dadgeha Şoreş û gel, ku ev roj gellek nêzik e. Silav ji bo şehîdan, serkevtin ji bo Kurdistanê. Mirin û neman ji bo rejîma terorîst ya Axûndî a Îranê. Endam û alîgirên PDKÎ li bajarê Seqizê

Sine

Silav û rêzên me ciwanên gundê “Gellên” a girêdayî bajarê Sine, bi bihîstina nûçeya dilgiran ya heval “Şehab heyderî” û “Hejar Rizayî”, gellek nerehet bûn, em sersaxiyê dibêjne malbata PDKÎ, pêşmerge û alîgirên PDKÎ bi taybet malbata serbilind a şehîd “Şehab Heyderî”. Em peymanê nû dikin, ku heta bidestveanîna armancên pîroz yên şehîdan kol nadin, û heta dawî henase ciwanên gundê “Gellên” û alîgirên PDKÎ yên li bajarê Sine a serbilind têdikoşin.

Rasan û xebata çekdarî



Kawe Behramî

Di nava torên civakî de, û herweha hinek ji dezgehên ragehandinê de, ku bîreke şovenîstî bi rê ve dibin, bas û mijarên xwe taybet kirine bi xebata gelê Kurd û danîna nîşana pirsyarê li ser xebata çekdarî.

Rohn û eşkere ye ku Rasana Rojhilat tevgerake çend alî ye, û amadeyiya pêşmerge di nava xelkê de yek ji payeyên serekî ên wê ye, ku şovenîstên ku li gora sedsalên navîn difikirin, vê Rasanê wekî hewlekê bona perçekirina Îranê dihesibînin.

Rasana Rojhilat pirosayeke bona hişyarkirina komên xelkê di biyavên civakî, aborî, siyasî û mafê mirovan, û ...hwd de, û ew mijar jî hewcehiya wê bi hebûna parêzerên van mafan heye di navxwe ya nîştiman de, û wekî pêşmerge çiya û bajar guh dide xwestek û daxwaziya civatên xelkê Rojhilata Kurdistanê, û serbarê polênkirina van kêşeyan di çarçove û mîkanîzmeke baş û bicî de wan



organize dike.

Bi xweşî ve hebûna pêşmerge di navxwe de, digel pêşwaziya xelkê welatparêz ê Kurdistanê bebrirû bû, ku di beşek ji navçeyan hêzên rejîmê gellek tirsinokane û bi xerckirina sedan milyon Tûmenî bi awayê herî nemirovane bose ji pêşmergeyan re danîne.

Ya ku cihê mixabiniyê û baldan û lêfikirîna ye, hejmarek ji dezgehên ragehandinê li derveyî welat û bi nav demokrat û azadîxwaz di kiryareke şovenîstane û bi hevsozbûna digel navendên rejîmê, ne tenê vê xebata rewa dibin jêr pirsyarê, û wekî cudahîxwaz dihesibînin, belku gellek xwe mezin dihesibînin û çaverê dikan ku emê şoreşger van pêngavên rewa şermazar bikin, û çavên wan nabîne ku bi dehan kes ji xelkê Kurdistanê bi roj-namevan û Kolber û pêşmerge ve çende nemirovane hatine şehîdkirin, û heta bo carekê jî ew basê nakin, û di hember de rojê dehan carî bas ji kuştîyên rejîmê dikan.

Ew xebata me ya rewa wekî hewlekê bo têkdana civakê û kuştina xelkê Îranê û êrîş û kemîndanîn, û tawanên hêzên serkutkar ên rejîmê jî wekî hewlekê bo parastina Îranê ji perçebûnê dizanin, ku beşek ji wan ew kes in ku bi sala ye di rêzên rejîmê de, li dijî xebata gelê Kurd çendîn kiryarên nemirovane bi rê ve dibin, û niha jî wekî metirsiyekê li ser berjewendiyên xwe dihesibînin.

Ez kurt bikim, ez xwe şanaziya dikim bi xebat û siyaseta rast û dirust ya hizba xwe, û bi taybetî çûna pêşmergeyan bo navxwey welat, û hemû wan hewlên şovenî di biyavê lawazkirina Rasanê dizanim, ku bi hewl û tekoşîna hemû aliyekî û yekîtiya xwe, dibe em pîlanên neyaran pûç bikin, û heta serkevtinê û rûxandina rejîmê em nekevin qedeman û nesekekin.

»»»» Doma manşetê

din.

Ew bûyer hevdem in digel komeke hewlên nezok ên bandên rejîmê bona siwarbûna bi ser şîpelên nerizayetiyan, û kontrolkirina rewşa jidestçûyî ya wan. Her di vê derheqê de Xatemi serokê banda bi nav reformxwaz ku heya duh îzna axavtin û derketinê ji wan hatibû standin, bona aramkirina rewşê û wekî emraza li ber destê Welîyê Feqîh anîn nav leyîzê, û navbirî rû li endamên banda xwe ragehand: “Heya wê demê ku reform zindî ye, cihek bi navê rûxanê tune ye!”.

Herwisa bona vê ku neçe ser pirsra rastîn û xwesteka xelkê, ku herifandina rejîmê ye, gotiye ku:

“Hinek kes dixwazin wisa nîşan bidin, ku ew bûyer tawan û guneha reformxwazan e, lê ez radigehînim ku bi tewahî ez berevaniyê ji Komara Îslamî dikim, û min jêve ye ku dibe em reformhilgir bin!”.

Herwisa Sadiq Zîbakelam ku wekî teorîsyenê “reorman” di Îranê de tê naskirin, di axavtineke bi vî rengî de gotiye: “Tenê riya gihîştina bi demokrasîyê, di nava sîstema Komara Îslamî de ye!, û mezintirîn kêşeya me, lawaziya civaka medenî ye!”.

Çalakeke siyasî di navxwe ya welat, di vê derheqê de bi “Kurdistanmedia”yê ragehandiye, ku ew hewla banda Xatemi û Rûhanî hevdem e digel rûmalkirina nûçeyên meşên nerazîbûnê ji aliyê malpera û kanalên telegramî ên eniya tundrev ku dixwazin wisa nîşan bidin, ku ew bûyer nîşana “Înqilabî” tevnegeriyana dewleta reformê ye, û nerasterast dixwazin vê fikrê bixin nava xelkê de, ku hekî emê “Înqilabî” li ser kar bûnaya, tu yek ji van astengiyan nedihatî pêş.

Ew çalakê siyasî di vê derheqê de dibêje: “Di vê rastayê de bona vê ku wisa nîşan bidin ku kêşe mijûl in çareser dibin, û wan gendelkar destnîşan kirine, û êdî xelk dikare herin malên xwe de, biryar dan e ku çend mohreyên şewitî û yek ji wan Ehmed Îraqî cihgirê pêşîn ê karûbarê erzên banka navendî, û karsazê yek ji cihgirên serkomar û çar çalakên erzî destbiser bikin, û vê diholê bikutin ku eva hemû kêşe û arîşeyek çareser dibin!”.

Yan di hewleke din ya nezok û cihê şermê de, rejîmê bi mifahwergirtina berevajî ji rewşa jiyana erdhejlê-dayiyên navçeya Serpêla Zehaw, bi bankên Kirmaşanê ragehandiye ku bi derkirina bexşnameyan qewlê dana wameke zêde bidin, da ku bo heyamekê jî be, vê kerb û kîna vî xelkê bêzarbûyî vemirînin.

25`ê Gelawêjê bazneyeke bihêz, felsefeyek Netewî



Mecîd Heqî

Yasaya duyem ya Niyoton dibêje ku buhaya guhartina bizavan, girêdanek rasterast bi hêza guhartinê ve heye. Wate asta guhartinan girêdayî xurtiya hêzan ve ye.

Avabûna Hizba Demokrat ya Kurdistanê di 25ê Gelawêja 1945`an de wekî nuqteguhartinê mezin li dîroka netewa Kurd de tê dîtin ku, xwediyê wan her sê taybetmendiyên e, ku di yasaya duyemîn a Niyoton de hatiye. Bi vê wateyê ku damezrandina hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê di serdemekê de ku civaka Kurdistanê bi hegerên nebûna rêxistinê, û hebûna rêberiya eşîrî û herêmî nekaribû bingehên avedankirina neteweyek modern û xwedî sazî ava bike, li paremayîna sistematîk de dijiya, ew yek bû hegera despêka hêza guhartinê di demek kurt de.

Xala duyemîn, Komara Kurdistanê li Rojhelata Kurdistanê de wek yekeyek siyasî ya modern û xwedî sazî bi armancên mirovî karî hevbednîyek civakî di navbera tex û qatên civakê pêk bîne, û Komara Kurdistanê bibe serekaniya nîrx û buhayên yekgirtiye civakî û netewî.

Xala din, Komara Kurdistanê di bi fermîkirina zimanê Kurdî wek zimanê xwendin û nivîsandinê de, bûye sedema çandina bingehên nasnameya netewî ya Kurd ku heya îro jî dom dike.

Bandora avabûna PDKÎ, bihêzbûna hesta xwebaweriyê, pêkhatina çanda rêberiya bikom û kolektîv, bilindbûna hesta netewî a hevbeş di nav hemû tex û qatên civakî û hesta kûre tenahiya hebûna Komara Kurdistanê bû.

Herweha damezrandina PDKÎ di dirêjdem de bû bingehê bo modernkirina pîrsa Kurd, xwe rojevîkirin li gor rewşa siyasî û aboriya jîngeha siyasî ya Kurdan û bi vî awayî jî parastina netewa Kurd li hember siyasetên helandin û jinavbirina Kurdan de.

Hesta netewî û xwedî derketin ji bingehên netewî, piroseyek demdirêj e ku ji roja avakirina PDKÎ Îranê ve heya îro dom dike. PDKÎ di dema damezrandina xwe de, bû hêzek xwedîhelwest li dijî faşîzmê, û bingehê bo demokrasî û toleransa civakî.

Ew xalguhertina han, bû hegera damezrandina dezgehên perwerdekirin û pêşveçûna nasnameya netewî li Kurdistanê, ku bandora wê heya îro jî tê xuyakirin. Herwek pêvajoya damezrandina PDKÎ û xebata piştî wê jî heya astekê dikare civakê pêşve bibe. Lewma bo her bizavek siyasî û netewî hewce ye ku xwe nûjen û digel şert û mercên civakî, siyasî û stratêjîk yên herêma jiyana xwe de, xwe biguncîne. Çûnkî her qonax û nîfşek ji civakê hewce bi despêk, stratejî û pilanek nû ji bo nûjenkirin û bihêzkirina xebata netewî heya gihîştin bi armancên bingehîn heye.

Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê piştî çend deh sal ji xebata siyasî û netewî ya xwe, li Newroza 2716`an a kurdî de, rûpelek nû ji xebatê hilda, û bi fermî pêşengtiya qonaxa nû ya vê xebata netewî li jêr navê "RASANA ROJHILAT", anku ji nûve rabûnê girte stûyê xwe. Bingeh û felsefeya "Rasan"ê digel bingehên destpêka xebata PDKÎ li roja 25`ê Gelawêja 1945`an de tewawkarê hevûdin e. Jiber ku ji aliyekî ve bi derbazbûna nêzik bi 40 salan ji hatine ser kar a rejîma Îslamî ya Îranê û dagîrkirina Kurdistanê ji aliyê desthilata navendî ve, nîfşên nû, mercên nû yên şaristanî, abûrî, civakî, çandî, siyasî û herwusa kûrbûna stratêjiya hêzê li herêmê, bi bikaranîna pitansiyelên nû û nûjenkirina metodên xebatê, rojev dike.

Destpêka qonaxa "RASAN"ê, bi xwe re hin pêvajoyên nû anîn rojeva xebata rizgarîxwaziya netewa Kurd li Rojhelata Kurdistanê:

1.Armanca xebata netewî, nîştimanî û giştgîrtir, zelaltir hatiye rohnkirin.

2.Kûrahiya Stratejiya xebata nûdem a Hizba Demokrat, rizgariya nîştimanî li seranserê Rojhelata Kurdistanê ye.

3.Bandora qonaxa "RASAN"ê li derwey sînorên Rojhelata Kurdistanê ye.

4.Xebata medenî û rêxistinên medenî beşa herî giring û bingeha qonaxa "RASAN"ê ye.

5.Navnetewîkirina pîrsa Kurd û bûn bi ekterek xwedî giraniya xwe li pêşeroja pilana siyasiye Îranê de, bazineya bi bandoriya xebata Rojhelata Kurdistanê mezintir û girantir kiriye.

6.Pîrsa wekheviya civakî û beşdariya wekhev û hevbeşe jinan bo pêvajoya "RASAN"ê pîrsek bingehîn û pîrensîpî ye.

7."RASAN" pêvajoyek Netewî ye ku mezintir li çarçoveya partiyek siyasî û pirojeyek netewî ya hevgirtinxwaz e ku dikare hemu hêzên siyasî, medenî û kesayetîyan li dewra xwe kom bike.

8.Sirûştê li dijî cudahîdanî û stemê, herweha dadperwerîxwaziya pêvajoya "RASAN"ê, ew qonaxa xebata Netewî bi despêka damezrandina xwe de demokrasî, mafê diyarîkirina çarenivîsê, toleransa civakî û dijberiya faşîzmê bi bingeh û armanc girtine, bi hev ve girê dide, û bazineya xebatek dadperwerî, mirovî û ekolojîst bi hev ve girê dide.

Li pêvajoya "RASAN"ê xuya ye ku hêzên siyasî, medenî û civakî yên beşdar li bizava Kurdistanê de diviya tevde li gor xwe, nasnameya xwe û pirojeyên netewî ên xwe bi fermî bîna nasîn û toleransa siyasî li bizava netewî de bê xulqandin. Encama wê yekê dibe sebeba wê ku di şûna rikeberî û dijheviyê hemû hêzên nav bizavê de bi alîkariya hev, hêz û pitansi-



yelên xwe ji bo rizgariya netewî bi kar bibin. Bêguman merca wê yekê, diyarîkirina armanc û stratêjiyê hevbeş û netewî ye ku berpirsiyariya wê dikeve ser rêberiya siyasî.

Encama wê yekê dibe sebeba giştgîrbûna xebata netewî û derbazbûn ji qonaxa dijheviya civakî. Rasana Rojhelatê Kurdistanê derfetek nû ji bo xebata netewî afirandiye ku hemû bijarde, rewşenbîr û êlîten civakî bikaribin li gor şiyana xwe beşdarî xebatek kolektîv bibin.

Em li demekê de ber bi 73`emîn salvegera damezrandina PDKÎ Îranê ve diçin ku pêvajoya nû piştî berxwedana bi salan û tehemula diwariyan û parastina berjewendiyên netewî û niha jî qonaxa "RASAN"ê ku hilgîrê gotarek siyasî- netewî li seranserê Rojhelata Kurdistanê ye, mizgîniya rojên geştir bi netewa me nîşan dide. Tevî wê jî gotara siyasî ya navnetewî ber bi arasteyekê ve diçe ku Rojhilata Kurdistanê dikare bibe yek ji ekterên girînge guhertinên herêmî û dînamîzma pêşeroja xerîteya siyasiya herêmê. Îro rojê di bin sîvana xebata berfirehe netewa Kurd û torên civakî, mirov hêsanîr dikare pîrsên xwe yên netewî bilind bike, û li hemberî neheqî û zulm û zoriyê serî hilde, û bi bandortir dikare xebatek kolektîv û xwedî buhayên hevbeş pêk bîne ji bo ku nîfşên pêşerojê neçar nebin dîsan xebatê bikin, belkî erk û wezîfeya wan avedankirin û pêşvebirina civaka Kurdistanê be, anku Kurdistanek Azad, Demokrat, ewle û xwedî stratejiya pêşveçûna domdar.

PDKÎ avekera Komara Kurdistanê û xwediye Rasana Rojhelata Kurdistanê



Partiya demokrat ya Kurdistanê ku di 16ê gelawêja 1945-an bi armanca rizgariya gelê Kurd li ser xîmê “Komeleya jiyaneweya Kurd” hate damezirandin, di heyamê 73 salan li temenê têkoşîna xwe de ewraz û nişîvên zaf qulipandine û serkeftin û şikestên mezin tecrîbe kirine. Lê çi carî ji riya xwe ya xebat bo azadiyê nesilîkiye û neziviriye.

Ew yêka ji bo wê partiyê bûye

pirîstîj û giraniyek bêhempa daye xebat û têkoşîna wê, hem di qada Kurdistanê û hem jî di qada navnetewî de; bi şêweyekê ku ne tenê biryar li ser çarenivîsa gelê Kurd di Rojhilata Kurdistanê de bi xebat û biryarên wê ve hatine girêdan û kartêkeriyek mezin li ser wê hindê datîne, belkû karnameya kar û xebata wê bi xwe çarenivîsa gelê Kurd tê hesabandin, û ew yek bo zaf kes û aliyan bûye pirsîyar:

Gelo giranî û girîngiya wê partiyê dizivire ser çi? Cihaba wê pirsê pirtûk têrê nakin û ne karê gotarek hanekî kin e. Lê em dikarin bêjin ku bi kurtasî cihaba wê pirsê dizivire bo wan xalan:

1. Partiya Demokrat a Kurdistanê yekemîn partiya nûjen ya Kurd e ku çareserîya pirsê netewî bo xwe kire armanç.

2. Arşîtektorê avakirin û damezrandina dewlet-neteweya Kurdî ye ku di sala 1946-an de karî di çarçoveya Komara Kurdistanê de û bi pêşengiya serkomar Qazî Mihemed, dewlet-neteweya Kurdî çekirin.

3. Têkoşîna wê partiyê bo pêşvebirin û bihêzkirina hemû faktorên sazkirina neteweya Kurd wek çand, dîrok, hesta hevpar ya netewî û parastina xaliya hevpar (welat) û ... hwd bûye, û niha jî her ew e.

4. Xebatek bê navbir di heyamê temenê xwe de bo mafê netewî û dana nîrxên mezin bo wê armançê.

5. xelkîbûn û piştgiriya wê partiyê li aliyê xelkê Kurdistanê ve.

6. Siyasetên durust û bipirensîp ên wê partiyê.

7. Parastina serxwebûna xwe ya siyasî û danîna xet û meşandina xebata dîplomatîk li ser bingeha parastina berjewendiyên neteweyî yên gelê Kurd bi giştî.

ku xelk her ji Makûyê ve heta Îlamê serpêhatiya hezaran şer û berxwedan û dastanên mîrxasiyê yên pêşmergeyên PDKÎ bi wehûnandina lawje û heyranan nîfş bi nîfş parastine û di dema xem û şahiya de bi gotina wan, hestên xwe parve kirine. Wek mînak, bi dehan lawje li ser komarê û Pêşewa, xebata çekdarî ya salên 67-68an, li ser berxwedana pêşmergeyan û şehîdan li aliyê xelkê ve hatine wehûnandin û gotin.

Alaya xebatê bo mafê netewî di Rojhilata Kurdistanê de ku li ser milê pêşmergeyên PDKÎ hatiye, û îro rojê gihîştîye nîfşa me, bi rûbarek xwînê û dinyayek fîdakariyê hatiye. Bo wê çendê bi dehan hezar li xelkê sîvîl, bi hezaran pêşmerge û bi sedan endamên rêberiyê û sê



ya PDKÎ bo azadî û mafê netewî. Yanî şanaziyên pişikdarê Rasanê li şanaziyê hemû xebatkarên qonaxên pêş xwe de, zêdetir e.



Jiber ku ew hem xwediye wan şanaziyan ne, ku nîfşê pêşîn afirandine û hem jî yê bibin xwediye wan şanaziyan, ku bi xwe li afirandina wan de rol û neqş hene. Nabe herwisa em li bîr bikin ku di xebata me ya nû de Rasan hem rêbaz e û hem jî metod e. Rêbaze: bi wê manayê

ku domandina riya şehîdan û bi xasmanî şehîdên rêber: Qazî, Qasimlo û Şerefkendî dom heye. Metod e: li ber ku bi şêweyek nû û li ser bingeha şîretê Dr. Qasimlo ê rêber, bi hev re girêdana xebata «çiya» û «bajaran» dixwaze li hemû potansiyêla gel bo serxistina xebatê mifahê werbigre, û bi kanalîzekirina hemû hêza gel, welat rizgar bike û azadiyê bo gel bi diyarî bîne.

Herwisa piştî rizgariyê jî, yê wan destkevtan biparêze, û ne tinê nahêle carek din komara nû ya Kurdistanê bê hîloşandin, lê li pêşkevtin û berfirehkirina wê de jî yê roleke mezin bilîze.

8. Têkoşîn bo dadperweriya civakî, mafê take kesî û bawerî bi mafê mirov û peyakerin wan di xebatê de.

9. Meşandina xebatê li gora zagon û pîrensîpên xebata rewşa.

10. Bawerî bi demokrasî û tîkelkirina wê tevî xebatê.

Hemû ew nîrxane û zaf nîrxên din bûne sedemê wê yekê ku xelkê Kurdistanê wê partiyê ya xwe bizane û çarenivîsa xwe bi çarenivîsa wê ve girê bide û di serkeftin û şîkanê wê de xwe hevpar bizane. Bo selimandina wê yekê tinê ew hinda bes e bê gotin

serokan canê xwe kirine gorî û bi hezaran kes li zîndanande tûşê îşkence û bêhurmetî û kiryarên nemirovane bûn, bi destê dijmin. Bi hezaran mal hatine kavilkirin û bi miliyonan li gelê me koçber bûn, û hesreta dîtina welêt tevî xwe birin gore, lê qet bê hêvî nebûn û li têkoşînê nevestiyan.

Ew tecrîbe û ders û nimûneyên fîdakariya wan bo me bi mîrat ma, û xwe di xebata me ya nû de-di Rasana Rojhelat de-dibe xwe bide nîşandan. Li ber wê yekê ye ku Rasana me nîrx û giraniya xwe heye, û pişikdarî li Rasanê de anku xwedî derketin ji hemû wan nîrx û şanaziyên xebata 73 salan

Nerîna Lîderan



Trump:

“Washington li Îraqê de, ligel aliyên serkevtî diaxe”.



Cewad Zerîf:

“Trump, Netanyahu û Bin Selman di cihanê de, cihê baweriyê nînin, ne Îran”.



Xatemi:

“Komara Îslamî ya Îranê naherife”.



Fatimê Zulqedr:

“Zewaca keçên jêr 18 saliyê, wê were qedexekirin”.

“Eshpigel”: Desthilata rejîma Îranê di metirsiyê de ye

Malpera Almanî ya “Eshpigel” di mijareke xwe de bi nîrxandina rewşa xelkê Îranê digel desthilata rejîma Îranê, rewşa Îranê metirsîdar daye zanîn.

Malpera belavoka Almanî ya “Eshpigel” di mijara xwe ya bi navê, “li bereberê germê de” (der astanê germazedîgî), bi lêkolîna li ser rewşa Îranê û kirîza hebûna kêmbavîyê, berfirehbûna gendelî û rikeberiya desthilata rejîma Îranê digel Amerîkayê, pêşeroja vê rejîmê û xelkê Îranê di metirsiyê de daye zanîn.

Di vê mijarê de îşare bi gef û axavtinên berpirsên leşkerî û siyasî yê rejîma Îranê hate kirin, ku li ser hemû pîrsgirêkên jîngeh û aborî û siyasî

ku tûşî xelkê Îranê bûne, tekez dikin li ser destêwerdanên welatên rojavayî bi taybet Amerîka û Îsra`îl û ev welatên ku bi sedemên kirîzan bi nav dibin.

Herwisa li ser kirîza avê di Îranê de, di vê mijarê de hatiye ku, serbarê guherînkariyên herêman li jîngeha Îranê û kêmbavîyê, bernamêyên şaş yê rejîma Îranê derheqê beşên çandiniyê de, hevparkirina av û qutkirina rûbaran û dirustkirina bendavan, bûne sedemên serekî yê kêmbavîyê di Îranê de, û piraniya deverên Îranê bi hebûna milyonan kesî digel kirîzan rûbirû bûne, û jiyanê nebaş hene. Bi awayê giştî di vê mijara malpera “Eshpigel” de bas ji vê hatiye kirin ku, kirîzên di nav Îranê de, di hemû warî de, destê rejîmê tê de ye, û sedema vê ku xelkê Îranê nerazîbûnên xwe nîşan bidin li hemberî xemsariyên berpirsên rejîma Îranê, û ji aliyekî din ve jî îşare bi givaşên cihanî yê li ser vê rejîmê bi taybet ji aliyê Amerîkayê ve kiriye ku pêşeroja desthilata vê rejîmê metirsîdar daye zanîn, û îşare jî kiriye ku berdeambûna vê rewşê, rejîmê digel herifînê rûbirû dike.



Politico: Di Îranê de Refom miriye!

Belavoka “Politico” di mijareke xwe de derheqê rol û devra bereya bi nav reformxwaz di Îranê de ji bo domandina temenê rejîma Teheranê, bas ji nemana baweriyê ve bandê, di nav xelkê Îranê de kiriye.

Di vê gotarê de hatiye ku: Herçend hindê kes û dibe xelkê Îranê yê ku niha di Amerîkayê de akincî ne jî, li ser vê bawerî bin ku bûyerên vê dawiyê yê di civaka Îranê de diqewmin pîlanên dewleta Amerîkayê ji bo “guhertina rejîmê” bin, lê ketwar (waqî`i) eva ye ku Amerîka kêmtirîn rol di van bûyeran de hebûye, eva ku çêbûye kerb û kîna xelkê hatî lêbadin yê Îranê ye, ku ev nêzîkî bi 40 salan e ji aliyê hikûmetê ve hatine lêbandin. Rastiya vê ewe ku xelkê nerazî, xelkê bivêr in ku di meşên nerazîbûnên medenî de li dijî komara Îslamî sekinîne, û ev meşên nerazîbûnan ji ber rewşa niha ya zal bi ser welat de ye, û bêzar bûne, bêzar jî soz û qewlên bê bingeş yê berpirsên rejîmê bi hemû pêhatiyên xwe ve.

Li gorî vê nivîsê, ev heyama du dehan e ku xelkê Îranê hêviya wan bi “reformxwazan” di Îranê de hebûye, û gellek lêkolîn û berevankaran jî ev rewş nîqaş kirine, lê dawîn nerazîbûn û silogên tûndrewan bas ji bêbawerbûna xelkê, bi “binajoxwa û reformxwazan” dikin armanc, ku aliyê reformxwaz bi awayê tewaw şikest xwariye, û cih û pêgeha van di nava civaka Îranê de nemaye. Di beşeke din ya vê babetê de hatiye ku: Xelkê Îranê piştî çendîn sal soz û qewlan ji aliyê reformxwazan ve di Îranê de, digel jinavbirina buha (pîroziyan) û nêzîkbûna bi herifîna aborî û jîngehê rûbirû bûne; Bi navê reformîstan ne tenê di bicihanîna tu yek ji xwastekên xelkê Îranê de serkevtî nebûne, belku rola serekî hebûne di domandina temenê komara Îslamî de, di rastiyê de ev aliya di nav hikûmeta Îranê digel aliyê din yê Îranê bihevre bûne.

Di dawiyê de jî: Serkomariya “Mihemd Xatemi” û “Hesen Rohani”vê yekê nîşand didin ku reform di nav komara Îslamî de miriye, û devra van dawî pê hatiye.

Amerîkayê du wezîrên Tirkîyê ceza kirin

Amerîkayê roja Çarşemiyê ragehand ku biryar daye Wezîrê Navxwe û Wezîrê Dadê yê Tirkîyê bi sedema rolekê ku di destbiserkirina qeşekî Amerîkayî de hebûne, ceza bike.

Silêman Soylo Wezîrê Navxwe û Ebdulhemîd Gul wezîrê Dadê ji aliyê Amerîkayê ve hatine tohmetbarkirina ku roleke serke di destbiserkirin û ragirtina “Andrew Branson” de hebûne. Tirkîyê jî ragehandiye ku “Andrew Branson” ajantî kiriye, û dest di kiryarên terorîstî de hebûye. “Sarah Huckabee Sanders” berdevka Koşka Spî jî ragehand: Ez guman dikim ku ew qeşeyê Amerîkayî li jêr serederiya zalimane, û ne cihê qebûlkirinê ji aliyê Tirkîyê ve bûye.

Wezîrê Xizînedariya Amerîkayê jî di daxuyaniyekê de ragehand: Destbiserkrina zalimane ya qeşe “Andrew Branson” û dirêjîya dadgehîkirina wî ji aliyê berpirsên Tirk ve ne cihê qebûlkirinê ye.

Di çarçoveya cezakirina van du wezîrên Tirkîyê de, perê wan du wezîran hate bilokekirin, û navê wan jî kete nava rêzbandekê de, ku navê wê rêzbenda bînpêkarên mafê mirovan e. Ew qeşe 21 meh in ku di girtîgehê de ye.

Erdoxan serkomarê Tirkîyê di axavtinên tûnd de helwest girt ku Tirkîyê di biyavê serbixweyiya dadwerî de li hemberî Amerîkayê de paşve navekêşe. “Andrew Branson” jî 20 sal berî niha ve di Tirkîyê de dijî, û tohmetabr e bi vê ku alîkariya girûprêkî kiriye ku ku di sala 2016`an de, dest di derbeya leşkerî de hebûye, lê wî qeşeyî ew tohmet ret kiriye. Tê gotin ku heke tohmetên li ser wî bêne selimandin, ewê bi 35 salan hepsê bê mehkûmkirin.

Jina pêşeng û pêşmerge



Ebdullah Hicab

Dîmenên pirr heybet û tije şanazî ên keçên ku xwe bi rext û çekan xemilandine, û di nava refên serbilind a pêşmergeyan de, di wan rojên dawîn li gellek deverên Rojhilata Kurdistanê derdikevin pêşberî xelkê, carek din nîşan da ku jina Kurd ji bo azadiya xwe xwedîbiryar û îradeyek bilind e. Keç û jinên ku hem li dijî dîktatoriya serdest serî hildane, û hem asteng û bendên ku di nava civakê de ji azadiya wan re dibin rêgir, li ser rê hildane, û niha bûne şandeyên azadiyê û tovê hêviyê li Kurdistanê direşînin.

Berxwedana jinên kurd li nav refên şoreşê li dijî rejîma Îslamî ya Îranê û vê dawiyê jî li hember rêxistina hov a DAIŞ'ê, nav û dengê jina kurd xistiya nav rûpelên dîroka hevçaxe cîhanê. Lê niha jina Kurd li Rojhilata Kurdistanê di vê qonaxê de dixwaze nîşan bide ku rizgarbûna jinê û gelên Rojhilata Navîn, bi tenê bi şikandina DAIŞ'ê re misoger nabe. Çûnkî rejîma Komara Îslamî berî peydabûna DAIŞ'ê bi heman îdeolojiya bigemar û heman nêrîna paşvero, şerê li hember mirovatîyê dabû destpêkirin. Lewma jina Kurd carek din dixwaze bi bawerîya serketinê berê çekên xwe bide serê mar û hevparê DAIŞ'ê li Îranê, û rejîma Komara Îslamî ji xwe re bike armanc. Gera bi çek a jinên pêşmerge li kûrahiya deverên ku bi tundî ji aliyê rejîmê ve hatine dagîrkirin, wê hindê nîşan dide.

Îradeya ku ji nêrîn û kena wan pêşmergeyên jin dibare, ku bi rûxweşî û dilek pirr ji hêvî ber bi gel ve diçin, nîşan dide ku serhildana vê carê li hember rejîma kevneparêze Komara Îslamî ya Îranê, serhildana hesab pirsînê ye. Lewma ew tirs û xofa ku jinên



Kurd di dilê çeteyên DAIŞ'ê de çêkiribûn, ser ji nû ve di dilê Pasdarên mirovkuj û çekdarên dinê yên rejîmê de vejîyaye.

Pêşmergeyên rûken û diltije ji evîna azadiyê, bi sekna xwe û daketina qadan, bibiryar in ku ji niha û pêve bi tenê beşdarî şoreşê nebin. Ew nîşan didin ku dikarin bibin pêşeng û wê ji bo rojên geşê li benda wan, ji niha û pêve her demê di rêza yekê de cî bigrin.

Ew demeke dirêj e ku Rojhilata Navîn bi bahoza qeyranan re rû bi rû ye. Gemara ku Komara Îslamî bi îdeolojiya xwe ya qirêj û kiryarên xwe yên têkder tev li wê bahoze kiriye, ne bi tenê civaka Îranê, lê hemû herêm aniye asta fetisînê. Lê Rojhilata Navîn xwedî dîrok û xwedî îradeya berxwedanê ye. Ji wê jî bi der, li Rojhilata Navîn gelê kurd û jina Kurd ya xwedî îrade û xwedî bawerî heye. Lewma gel û civakên Rojhilata Navîn, wê li hember rejîma Îslamî ya Îranê serî hildin, û ji bo wê serhildanê hêviya wan Kurdistan e. Ew serhildan wê dereng û zû hebe, lê wê vegeer jê tine be.

Nîşaneyên serhildana li hember Komara Îslamî roj bi roj zêdetir derdikevin. Di navxweyî Îranê de, xwepîşandan û dijberiyên ku virade- wêde li dijî rewşa jiyana rojane têne encamdan, nîşaneyên serhildanek berfireh in ku bi rê ve ye. Li derveyî sînorên Îranê jî, hêdî-hêdî qad ji Komara Îslamî tê bertengkirin. Xelkê başûrê Îraqê ji destwerdanên pasdar û besicên Îranî bêzar in û bi rojan e ku dijberiya xwe li hember destwerdanên Îranê bi xwepîşandanan tînin ziman. Li Sûryê, Îsrayîl hebûna Komara Îslamî tehemul nake. Li Yemen û deverên din jî êdî rejîm nikare weke caran bi dilê xwe tev bigere.

Abûriya Îranê ji salan pitir ber bi hilweşînê ve diçe. Diravê welat, ji avrû û hitbara melayên deselatdar bînîrxîr bûye. Buhayê hewcedariyên rojane yên xelkê ji kontrolê çûye der, nexweşiyên civakî yên ji ber gendelî û destpîsiya deselatdaran her tê û zêde dibin, û civak perîşan kiriye.

Di wê rewşê de, tê çaverêkirin ku bahoza guhertin û veguhertinan di demek ne zêde dûr de, ber bi

Îranê ve vegere. Niha jina şiyar û xwedî îrade ya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê amadekariya xwe dike ku di nava wê bahoze de, weke pola bisekine û û rola xwe ya pêşeng di têkoşîna li dijî kewneparêziyê de bilîze.

Jina Kurd, azadiya xwe di kincên pîroze pêşmerge de dibîne, lewma niha berê xwe dide çiya û xwe ji bo roja hesabpirsînê amade dike. Ew dizane ku niha dem, dema nîşandana îradeya berxwedan li hember Komara Îslamî ye. Lewma keç û jinên ku dilê wan bi hesreta azadiyê lê dide, bi tev-lêbûna di nav refên pêşmergeyan de, dixwazin rêya azadiyê nîşanî civakê bidin.

Deriyê şoreşa Kurdistanê û Hizba Demokrat ji bo beşdariya jinan vekirî ye. Bi bawerîya hizbê, civaka azad bi destê jina azad û bi rêya pêşengitiya jinê tê ava kirin. Avakirina civaka azad tê wateya rizgarbûn ji zulm û çavsorîya Komara Îslamî û hemû bawerî û îdeolojiyên geniye weke nêrînen Komara Îslamî.

Pîrozbhiyên rêberên Kurd û navendên medenî û çandî yên Kurd ji “Koçer Bîrkar” re

Hejmarek ji rêberên Kurd, li parçên Kurdistan û navendên çandî û medenî yên Kurdî, pîrozbahiyên xwe ji “Koçer Bîrkar” hilgirê xelata “Fields” ya bîrkariyê re gotin.

Li gorî nûçeya gihiştî Ajansa “Kurdpa”yê, hejmarek ji rêberên Kurd, ji her çar parçên Kurdistanê, navendên çandî û medenî yên Kurdî, bi awayên fermî pîrozbahiyên xwe ji “Koçer Bîrkar” yê ku xelata “Fields” wergirtiye gotin.

“Mistefa Hicrî Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ”, Mes`ûd Barzanî Serokê Partiya Demokrata Kurdistanê”, “Mehmûd Hacı Mehmûd, sekreterê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê”, “Mistefa Mewlûdî sekreterê HDK`ê”, “Ebdulah Muhtedî sekreterê Komela Şoreşger a Zehmetkêşan a Kurdistana Îranê”...û hwd.

Herwisa sazî û navendên çandî yên weke Encûmena Kulturî ya Merîwanê, Navenda Kulturî a Civakî ya Zagrosê ya li bajarê Sine, Encumena Kesk ya Çiyayê Merîwanê û herwisa Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistana Îranê jî, pîrozbahî ji vî Kurdê jêhatî kirin. Pirofesor “Fireydûn Direxşanî” yek ji mamostayên ciwan li zanîngeha “Kembridge” a li welatê Bîrîtaniyayê karî midala “Fields”, ku binavûdengtirîn xelata cihanî ye, di beşa bîrkariyê de bi dest bixe.

Midala “Fields” li sala 1936`an heyani niha, ji aliyê navenda “Fields” ve li bajarê Torêntoyê de, û her çar sal carekê bi du heta çar çalakvanan li beşa bîrkariyê di cihanê de dibexşe, ku temenê van li jêr 40 saliyê de ye.

“Fireydon Drexşan”naskirî bi (Koçer Bîrkar) xelata 2016`an a Encumena Bîrkariyê ya Amerîkayê tevî sê bîrkarên din ji xwe re bi dest xistin.

“Koçer Bîrkar”, li sala 1357 li gundê”Nê” a girêdayî bajarê Merîwanê ji dayîk bûye, û bawernameya karnasiyê li zanîngeha Tehranê wergirtiye, û navbirî qonaxa duxuriyê li “Natîngam” li Bîrîtaniyayê tewaw kiriye, û ji sala 1385`an ve weke pirofesorê bîrkariyê li zanîngeha “Kembridge” dest bi kar bûye.



Yek ji keçên Şîrawê: Ez êdî ji xudîkê (neynûkê) bêzar im

Keçên xwendingeha Şîrawê, ku nêzî 7 sal berî niha bi sedema agirgirtina yek ji polên dersxwandînê di xwendingeha Şîrawê rastî şewitînê hatin, piştî 360 caran neştergeriyê niha jî ji dest êş û azarê de dinalînin.

Rojnameya “Qanûn” gotûbêjek digel keçên Şîrawê, li jêr serxetê “Men ez ayinê bîzarem” (ez ji xudîkê bêzarim) pêk aniye, ku her yek ji keçan bi awayekî bas ji êş û azarên xwe dikan.

Ajansa “Kurdpa”yê, bi piştgirêdana bi rojnameya Qanûn kurtiyek ji axavtina çend kes ji wan keçan belav dike, ku weha ye:

Sîma Muradî: Êdî naxwazim ji dewletê re kar bikim, jiber ku gellek zulm li hemû keçên şîrawê kir, hinde ji dewletê re giran nebû ku xercê derzî-dermanan bi tewahî bide me, yan me bişîne derve, heya ku em vegerin ser jiyana xwe ya asayî.

Şadî Îbrahîm: Êdî min tu daxwazek ji berpirsan nine, tenê pirseke min heye, gelo hekî zarokên we rastî bûyereke bi vî rengî bibin, hûnê wekî me agehdarî wan bin, gelo pişka me zarokan, ji perê neftê cebirîna birînên me nebû?!.

Nadiye Salih: Heya niha çar kes ji van 12 kesan di nava me de, dest dane xwekuştinê, û em jî berdewam bîr ji xwekuştinê dikan.

Esme`e Diruy: Renge ji we re balkêş be, ku heta em nikarin bibin xwediye karta millî jî, jiber ku tiliyên me nemane, û me devsa tiliyan tune, em ji vî mafî bêpar in.

Mubîna Perkem:

Min hêviyek di jiyane de heye, tenê dixwazim bo carekê jî be, guharekê bikim guhên xwe de, lê nikarim jiber ku min her du guhên xwe ji dest dane.

Arizû Tahirabadî: Ez ji xudîkê bêzarim, ji mêjve ye ku min xwe di neynûkê de nedîtiye, şewitînê em ji her tiştî bêpar kirine, min hez dikir ku birî hebin, lê min nine, her roj berî hemû karî dibe ku ez bi qelemê biriyên xwe çê bikim. Ferîde Omîdewar: Min hez dikir ku walîbalê bilîzim, lê tiliyên min nemane, û îzna vî karî nade min. Sîma Şadkam: Ez heyameke tûşî nexweşiya xemokiyê bûme, ku di piraniya deman de bêhiş dibim, ku bi sedema xemokiya zêde ji qas e.

Roja 15`ê Sermaweza sala 1391`an de bû ku 37 dersxwanên keç bi sedema agirgirtina sobeya yek ji polên xwendinê di xwendingeha Şîrawê rastî şewitînê hatin, û du dersxwan jî bi navên Seyran Yêgane, û Sarîna Resûlzade bi vî sedemê ve jiyana xwe ji dest dan.

Li gora gotina Husên Ehmedîniyaz di heyama van şeş salan de, heya niha zêdetir ji 360 neştergerî bo van keçan hatine kirin, û dibe dewlet cubrana van xesarên canî ên qurbanîyan bide.



Peyama pîrozbahiyê ya Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê ji “Koçer Bîrkar” re

Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê, di peyamekê de pîrozbahiyên xwe ji ciwanê Kurd yê jêhatî “Koçer Bîrkar” re şand.

Deqa peyamê wiha ye:

Peyama pîrozbahiyê ya Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistanê, ji bo ciwanê Kurd yê jêhatî “Koçer Bîrkar” hilgirê bawernameya mezintrîn xelata matematîk a cîhanê.

Pirofesor “Fireydûn Direxşanî” naskirî bi “Koçer Bîrkar”, hevweletiyê Kurdê Kurdistanê Îranê û mamostayê zanîngeha “Kembridge” a welatê Britaniyayê karî bibe xwediyê medala “Fields” a navûdengtirîn xelata cîhanê li beşa bîrkariyê de, û bi vê deskevta mazin hem hêvî jê re xwastin, û hem bû cihê keyfxweşî

û serbilindiya hemû takên Kurd.

Çîroka pirofesor “Koçer Bîrkar”, tevî vê ku nîşaneyê hewl û têkoşîna bê hempa ji bo bidestveanîna xewna mezin ya takên Kurd e, û tijî ji şanazî û serbilindî ye, hevdem kûrahiya tirajîdiya neteweya li jêr zilm û stemê de nîşan dide, û bi dehan “Koçer Bîrkarên”ên din tîne bîra me, ku li jêr sîbera desthilat û destûra dijîgelî ya komara Îslamî ya Îranê riya gihîştin bi xewn û daxwazên wan hatine berbestkirin, û pêş ji van hatiye girtin, ku her di bajarê Koçer û Kurdistanê de bi awayê giştî deha curên bi vî rengî hebûne, ku pişka wan, mijûlbûna bi jiyana bi neçarî û destengiyê bûye.

Navenda Hevkariyê ya partiyên Kurdistanê Îranê, bi boneya vê deskevta tijî ji serbilindiyê, li pirofesor “Fireydon Direxşanî” û hemû komên xelkê Kurdistanê pîroz dike, û em hêvî dikin ku ev deskevta bibe destpêkek ji bo serkevtinên mezintir û derketinên zêde yên wî, û hevdem bi herifîna dîktatoriyeta Îranê, em şahîdê azadî û çêbûna derfetên bicî ji bo vegeşiyana hemû ciwanên welat di warên cuda de bin.

Navenda hevkarîyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê

12`ê Gelawêja 1397`an



Dewreyeke hînkirina zimanê Kurdî li Rojhilata Kurdistanê bi rê ve çû

Bi armanca hînkirin û xwendina bi zimanê dayîkê, dewreyeke hînkirina zimanê Kurdî di yek ji bajarên Rojhilata Kurdistanê de bi rê ve çû.

Li gorî nûçeya ku gihîştî malpera “Kurdistanmedia”yê, Navenda Hînkirina Zimanê Kurdî, a bi navê “Hawraz” ji bo hînkirina xwendin û nivîsîn bi zimanê dayîkê, li bajarê Pîranşarê dewreyeke perwerde û hînkirinê li dar xist, û bi serkevtiyane dawî pê hat.

Di vê dewra hînkirinê de, 14 fêrxwazên zimanê Kurdî li temenê cuda de beşdar bibûn, û ev kesên fêrxwaz piştî hînbûna xwendin û

nivîsîn bi zimanê Kurdî, karîna bawernameya dawîhatina vê dewrê werbigirin.

Yek ji mamostayên vê navenda perwerdehiyê ragehandiye ku, biryar wisa ye ku di pêşerojê de dewreyeke din ya hînkirina bi zimanê Kurdî ji bo 18 kesên din wê bê lidarxistin.

Navenda Hînkirina Zimanê Kurdî a “Hewraz” dewrên xwe yên hînkirina zimanê Kurdî, li jêr silogana “ziman nasnameya me ye” bi rê ve dibe.

Madeya 15 ya yasaya bingeîn ya rejîma Îranê ev nêzîkî 40 salan e ku ev yek erê kiriye û bas ji vê dike ku neteweyên Îranê dikarin bi zimanê dayîkê yên xwe li kêleka zimanê Farsî de bixwînin û binivîsin, lê heyanî niha ev yek cîbicî nekiriye, serbarê vê ku xelkê Rojhilata Kurdistanê bi xwe hewl didin hînkirina zimanê Kurdî bibin.



Pirtûka Ebdilrehman el-Kewakibî bi Kurdî hat weşandin

Nivîskar û wergêra Kurd Fedwa Derwîş pirtûka Ronakbîrê Sûrî ku wek yek ji ronakbîrên serdema ronesana Erebî tê naskirin, wergerandiyê zimanê Kurdî û pirtûk ji aliyê weşanxaneyê J&J hatiye weşandin.

Fedwa Derwîş, wergêra pirtûkê wiha li ser nivîsiyê: “Ev pirtûka

el-Kewakibî (Tebayih el-Istibdad) ku bi sernavê ‘Xûyên Zordariyê’ me wergerandiyê ser zimanê Kurdî, yek ji makepirtûkên pirtûkxaneyê erebî tê hejmartin û wekî girîngtirîn a pirtûka el-Kewakibî tê nirxandin.” El-Kewakibî bi vê pirtûkê di cîhana erebî û îslamî de navdar bûye. Her bi vê pirtûkê jî, ew bûye cihê girîngpêdan lêkoler û rojhilatnasên cîhanî. Heta roja îro, pirtûk û nivîsên el-Kewakibî ji bo lêkolanan çavkanî û jêderên girîng in.”

Fedwa Derwîş di sala 1968an de, li bajarê Qamişlo yê Rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye. Derwîş ji bilî Pirtûka el-Kewakibî, du romanên romannivîsê Kurdê navdar Bextyar Elî, yên bi sernavên “Apê min Cemşîd Xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir” û “Êvara Perwanê” ji Kurdî wergerandine erebî, lê hêj nehatine çapkirin.

Zimanê Kurdî

Tiştonek



پێڕێش سێرگرمی قان

A: Mahir Berwarî

11- Mamosta Nûrî Elî Emîn di “Rêzimanî Kurdî”() de, cînav li ser (8) beşan parve kirine :

- Cînavên kesî
- Cînavên likaw
- Cînavên xweyî
- Cînavên îşarî
- Cînavên geyener
- Cînavên pirsîyarî
- Cînavên nadiyar
- Cînavên heyî

12- Mamosta Mustefa Xurremdil di “Serfî Destûrî Zebanî Kurdî Soranî”() de, cînav kirine (4) beş :

- Cînavên kesî
- Cînavên nîşandan
- Cînavên hewbeşî (hevbeşî)
- Cînavên xawenî (milkî)

()

13- Dr. Kurdistan Mukriyanî di lêkolînekê de, cînav bi vê parvekirinê destnîşan kirine .

- Cînavên kesî
- Cînavên likaw
- Cînavên nîşane
- Cînavên pirsîyarî
- Cînavên çendî
- Cînavên heyî
- Cînavên xweyî
- Cînavên nadiyar
- Cînavên diyar
- Cînavên na (neyînî) .

14- Mes’ûd Mihemed jî, di gotareke berfireh de,() li ser cînavan rawestiyaye û ew kirine (7) beşên sereke :

- Cînavên kesî
- Cînavên lêkder (geyener)
- Cînavên pirsîyar
- Cînavên îşarê
- Cînavên xweyî
- Cînavên heyî
- Cînavên nadiyar

Diyare ku parvekirin û navlêkirina cînavan, li nik zimanzanên kurd (K J) û (K X) nêzî hev in . Da-nasîna cînavan jî, li nik wan şarezayan di çarçewa vê têgehê de digere : Cînav ew bêje ne, yên ku di rêxistina hevokan de cihên navan digirin . Wek : - Serdar alîkariya hevalê xwe dike

- Kî yê biçe daristanê ?
- Dengê çi tê me ?

- Le bin xurî, le ser dirrî, heta dezanî pêwe detirrî. (* Jûjî)
Mamêkim heye le deştê, sê sed tîrî le piştê.

- Eger aqildarî û eqlit le bîre, le teyrekana kamyar be şîre.
(* Şmşemekuwêre/şevrevîn)

- Serî şax e, kilkî kêl e, qingî kêr e, dengî dilêr e, nawî şêr e. (* Keleşêr/dikil)

- Mil nexşîn e le çiyay zûr e, rengî bûr e qaçî sûr e, dojminî xoytî û xo xor e. (* Kew)

- Le asmanan tebeq tebeq, le ser mîlî kurt û kelek, mandû nebî ebabelek. (* Leqleq/leglege)

- Serî mar e, piştî kar e, zigî berx e, du kelex e. (* Peresêlke/meqe-sok)

- Dêtewe kulkin, dewêtza ne kulkin, beçey beçeza kulkin.
(* Mirîşk û hêk)

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja!
Hûn dikarin bersiva
tiştonekan bi riya E-Maila
Agiri2003@gmail.com ji
me re bişînin



Partiya Demokrat pîrozbahî li Koçer Bîrkar kir



Koçer Bîrkar bîrkarê
Kbijardeyê neteweya
Kurd, xelata herî bi-
navûdeng a bîrkariyê ya
cîhanê bi dest xist.

Professor “Fireydûn
Direxşanî” mamostayê
ciwan yê Kurd, di za-
nîngeha “Cambridge” a
welatê Birîtaniyayê xelata

“Fîldz” a binavûdeng ku
xelata cîhanî ye, li beşa
bîrkariyê de bi dest xwe
xistiye.

Midala “Fields” di sala
1936’an heyani niha, ji
aliyê Navenda “Fields” li
bajarê Torrentoyê de, her
çar salan carekê bi 2-4
kesên çalak û jêr temen 40

saliyê tê dan, ku di beşa bîrkariyê li cîhanê de kar dikin.

Herwisa xelata sala 2016’an ya Encûmena Bîrkariyê a Amerîkayê jî, ji “Fireydûn Direxşan”, (Koçer Bîkar) û 3 bîrkarzanên din re hate pêşkêşkirin. Ev xelata her du salan carekê, ji wan kesan re tê dan ku di biyavên bîrkariyê de lêkolînan dikin, û “Koçer Bîrkar” jî di beşa “Hindise û cebir” de çalakiyan dike. Piştî serkevtina vî ciwanê Kurd di beşa bîrkariyê de, xelkê Kurdistanê di torên civakî de bi rengên curbi-cur keyfxweşiya xwe bi boneya serkevtîbûna vî ciwanê Kurd nîşan dane, û bi heştêga #Koçer#spas#Caucher#Thankyou# pîrozbahiyên xwe ji vî bîrmendên Kurd re şandin. Ev bîrmendê neteweya Kurd, piştî wergirtina midala “Fields” ragehandiye ku: Hêvî dikim bi vê xelatê bikaribim keniyê bixim ser lêvên 40 milyon Kurdî”.

Bidestveanîna vê xelatê ji aliyê bîrmendê Kurd, di cîhanê de li ser medyayên cîhanî deng vedaye, û hemû medyayên cîhanê bas ji serkevtina vî ciwanê Kurd dikin.

“Koçer Bîrkar” li sala 1357’an li gundê “Nê” ya girêdayî bajarê Merîwanê ji dayîk bûye, û bawernameya karnasiyê li zanîngeha Tehranê wergirtiye. Navbirî qonaxa dukturayê di zanîngeha “Natîngam” a Birîtaniyayê tewaw kiriye, û li sala 1385’an weke professorê bîrkariyê li zanîngeha “Cambridge” dest bi kar bûye. Wî ciwanê Kurd heyani niha di 20 welatên cîhanê de, civîn derheqê dawîn destkevtên bîrkariyê li dar xistiye.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, tevî pîrozkirina ji vî bîrmendê neteweya Kurd, keyfxweşiya xwe bi boneya serkevtina vî ciwanê Kurd nîşan da û hêviya serkevtinê di warên din yên zanistê de ji bo wî ciwanê Kurd xwast.

“Akam Rehîmî” têza zanîngeha xwe pêşkêşî şehîd Serwan “Çeko” kir

Akam Rehîmî kurê
Şehîd serwan “Çeko
Rehîmî” têza zanîngeha
xwe ya li beşa (Artificial in-
telligence) pêşkêş bi rêbaza
şehîd serwan “Çeko”yê
nemir kir.

“Akam Rehîmî” piştî hewl
û têkoşîneke bêmînak
di zanîngeha “Sasêks”,
li welatê Birîtaniyayê,

li beşa (Artificial intel-
ligence) de pileya yekem
di vê zanîngehê de bi dest
ve anî, û têza bidawîanîna
beşa xwendina xwe
pêşkêşî rêbaza şoreşgirane
ya bavê xwe kir.

Rehîmî tevî nîşandan
keyfxweşiya xwe ji ber
serbilindkirina malbata
xwe, û hizba xwe, sê xe-
latên ku ji aliyê serokatîya

zanîngeha “Sasêks” ve pêşkêşî wî hatibûn kirin,
navbirî ev sê xelat pêşkêşî rêbaza bavê xwe yê
şehîd “Çeko Rehîmî” kir.

“Akam Rehîmî”, piştî van serkevtinane, ji aliyê
mamostayê zanîngehê ve daxwaz jê hate kirin da
ku xwendina xwe bidomîne, û dukturaya xwe di
beşa (Artificial intelligence) de bixwîne. Navbirî
bas jî vê jî kiriye ku, ji bo qonaxa dukturaya xwe
bîr ji vê kiriye ku, wê ev pirojeyekê hîlbijêre ku bi-
kare di pêserojê de alîkar be, di ber bi pêşvebirina
karûbarên hizba xwe û gelê xwe.



Parêzgehên Kurdistanê yên Îranê, ewlehîtirîn parêzgehên Îranê ne

Nûçegihaniyên girêdayî rejîma Îranê di serjimêriya derheqê diyardeya dizîkirin di Îranê de îşare bi vê kiriye ku, parêzgehên Îranê yên ku Kurd lê ak-
incî ne, di warê diyardeya dizîkirinê de ji hemû parêzgehên Îranê yên din ewlehtir in.

Nûçegihaniya “Tensîm” a girêdayî rejîmê di raporeke xwe de, îşare bi dawîn serjimêriyên sala 1395’an kiriye ku ji aliyê navenda serjimşriya Îranê ve hatiye encamdan gotiye ku, 585 hezar û 906 caran dizîkirin di Îranê de hatiye encamdan, ku li çav 5 salên derbazbûyî, ji %5 bo %7 zêde kiriye.

Li gorî vê amarê piraniya curên dizîkirinê taybet in bi parêgehên weke Tehran bi rêjeya %36, Elborz bi rêjeya %8, Xurasana Rezewî bi rêjeya %12, Xûzistan bi rêjeya %5.5 û Îsfahan jî bi rêjeya %5, û di vê navberê de nizmîtirîn curên dizîkirinê taybet in bi parêzgehên weke Sine, Gîlan, Hemedan, Urmiye û Çiharmehal û Bextiyarî.

Di vê serjimêriyê de, dizîna tirombîlan %40 û alavên nav tirombîlan jî bi rêjeya %14 zêdetirîn curên dizîkirinê bi xwe giritiye.

Belavbûna amareke bi vî rengî, derheqê diyardey dizîkirinê di parêzgehên Îranê de û hebûna parêzgehên weke Tehran û Elborz li serveyî hemiyan in di rêjeya vê diyardeyê de, û ev yeka jî baştirîn derfet e ji bo pûçkirina îdi’ayên rejîmê yên ku dibêje deverên Îranê yên ku Kurd lê akincî ne, ewleh nînin.